Bu halda bir neçə gəlmə erməni tayfasının törətdiyi əhvalatlardan yazmaq lazımdır. Əvvəla, mərhum İbrahim xanın hökmrənliyi zamanında Pənahabad, yəni Şuşa qalasının şərq tərəfində Bağırqan dağı deyilən yerdə bir uca qaya vardı. Həmin dağda öz təbəələri ilə Avan Koxa adlı bir erməni yaşayırdı. Avan Koxa öz təbəələrinə buyurmuşdu ki, harda əllərinə müsəlman düşsə, tutub onun hüzuruna gətirsinlər. Avan Koxanın əmrilə tutulmuş müsəlmanı çıpaqlayıb üzü üstə yerə yıxdılar. Sonra onun arxasının dərisindən dörd barmaq enində bıçaqla boynundan qom ətinəcən iki tərəfdən xətt çəkdirər və dərinin ucunu aşağı əydirilmiş ağacın qüvvətli bir budağına bənd edib budağı buraxırdılar. Ağacın budağı qüvvətlə yuxarı qalxanda o yazıq müsəlmanın dərisi boynuna qədər soyulardı və onun bağırtısı o dağa düşərdi. Bu əhvalatı görənin və eşidənin də bağır qan olardı. Buna görə də həmin qayaya «Bağır qan dağı» adı vermişdilər.

## QƏDİMDƏ ERMƏNİ-MÜSƏLMAN DAVASI

1260-cı (miladi 1844) il tarixdə



gətirib, mühafizə edib sakitləşdirdilər. Cahil müsəlmanlar isə ermənilərin vurub baş-gözlərini yardılar. Xülasə, şəhərin hakimi birtəhər müsəlmanları sakit edib erməniləri böyük fəlakətdən qurtardı.

\*\*\*

Hicri 1294-cü (miladi 1877) ildə rus-osmanlı müharibəsində rus dövlətinin ordu başçılarından bir neçəsi erməni tayfasından idi. Həmin ermənilər Qars şəhərini tutarkən düşmənçiliklə nə qədər müsəlman kitabları və Qur'ani-Şərif əllərinə keçirdisə, yandırdılar.

\*\*\*

Həmin tarixdə ermənilərin böyük sənətkarları İrəvan şəhərində Üçkilsədə (Eçmiədzin) maşın tərtib edib, 9 milyon qəlp eskinas pul kəsdilər. Dövlət xəbərdar olub, qəflətən tökülüb həmin pulu və maşını müsadirə edib, pulkəsənləri və kəsdirənləri tutub cəzalandırdı.

\*\*\*

Hicri 1321-ci (miladi 1903) il tarixində müsəlman kəndindən olan Məhəmməd və Salman adlı iki qardaş öz yüzbaşılıqlarına etiraz əlaməti olaraq qaçıb meşənin içində kömür yandıran Aleksan adlı dağlı bir erməninin yanına gəldilər. Həmin iki qardaş ermənilə hal-əhval etdikdən

gəldilər. Həmin iki qardaş ermənilə hal-əhval etdikdən sonra əyləşdilər. Hava soyuq olduğuna görə bir az quyunun kənarında oturub qızındıqdan sonra xurcunlarında olan yeməyin hamısını çıxarıb, yarısını erməniyə verdilər, qalanını isə özləri yedilər.

Əhvalatdan xəbər tutan bu iki cavanın ata-anası hər gün yemək və çörək gətirib həmin kömürxanada onlara verirdilər. Bu əhvalat bir neçə gün belə davam etdi. Yəni bir gün onlara dadlı yeməklər gətirdilər. Cavanlar yeməyi yarıya bölüb, yarısını erməniyə verib, yarısını özləri yeyib, isti vura-vura yuxuya gətdilər. O məlun erməni özündən savayı, qabaqcadan daha iki erməni gətirib orda gizlətməmişdi. Elə ki cavanlar yatdı, ermənilərin hər üçü durub əllərində balta yavaş-yavaş gəlib, o biçərələrin başlarını iki parə etdilər. Cavanlar birçə dəfə çığırub canlarını tapşırdılar. Sonra o məlun ermənilər o biçərələri ürəyən edib, paltarlarını və ciblərini soyub, bədənələrini kömür quyusuna atıb yandırdılar.

Yenə bu günlərdə Əfətli kəndinin müsəlmanlarından iki nəfər şəxsi Balıca kəndinin erməniləri hiylə ilə tutub öldürmüş və meydlərini yandırmışlar.

\*\*\*

Hicri 1321-ci il (miladi 1903) tarixdə rus-yapon müharibəsi zamanı bir qarabağlı erməni yapon dövlətinə dəyəri bir milyon yarım manat olan bir gəmi peşkəş elədi. Bu zaman rus dövlətinin başı müharibəyə qarışdığına görə ermənilərdən çağırılmış əsgərlər dövlətə xəyanət edərək dəstə-dəstə silahları ilə bərabər, Osmanlı və İran dövlətlərinə qaçdılar. Qərəz, öz məzhəblərinin qaydası ilə andlarına yalan çıxıb müxtəlif xəyanətlər edirdilər.

**Ardı var**

**Səhifəni hazırladı: Tahir Süleyman**

## Serok Mesûd Barzanî li Pîrmamê bi Hevserokê YNKê re civiya



Serok Mesûd Barzanî do li Pîrmamê bi Hevserokê YNKê Bafil Talebanî re civiya. Di civînê de mijara sereke, gihîştina rêkeftinê li ser posta serokomariya Iraqê û bihêzkirina yekdengiya Kurd bû li

Bexdayê. Di derbarê civîna serkird-eyên Partiya Demokrata Kurdistanê (PDK) û YNKê de, Siyasetmedar û endamê berê yê Polîturoya YNKê Fereydûn Abdulqadir, xweşbîniya xwe anî ziman û da zanîn: "Ez

gelek xweşbîn im, li gor min hemû amaje wê nîşan didin ku wê bigihîjin rêkeftinê. Min do bersiva xwe ji kak Mesûd sitendiye, bersiva wî gelek erênî ye. Biryar dane rêk bikevin, Bafil Talebanî ji bo rêkeftinê çûye (serdana Hewlêrê), ne ji bo nîqaşe."

Li gor zanyariyan, di civînê de 2 pêşniyaz derketine pêş; yek ew e posta serokomariya Iraqê bidin PDKê û postên wezaretan jî bidin YNKê. Pêşniyaza duyem jî ew e, PDK dengê xwe bide namzedê YNKê, bi şerta ew ne Berhem Salih be. Di demekê de ku hewldanên ji bo pêkanîna kabîneya nû ya hikûmeta Iraqê berdewam in, ji ber rêkneftinê, PDK û YNKê namzedên cuda ji bo posta Serokomariya Iraqê diyar kirin.

**PeyamaKurd**

## Sîrwan Barzanî: Amerîkî ji ber operasyonên Pêşmerge û Artêşa Iraqê yên li dijî DAIŞê kêfxweş in

Berpîrsê Mihwerê Mexmûr - Giwêr ê Pêşmerge Sîrwan Barzanî bi peyamekê diyar kir, Amerîkîyan kêfxweşiya xwe ji ber operasyonên hevbeş ên Pêşmerge û Artêşa Iraqê li dijî DAIŞê nîşan dan.

Sîrwan Barzanî da zanîn: "Li baregeha eniyê, me pêşwazî li Berpîrsê Fermangeha Hema-hengîya Asayîşa Amerîkayê li Herêma Kurdistanê Col. Patrick Douglas û Col. Sun W. Kim li Nivîsgeha Pêveka Leşkerî li Herêma Kurdistanê kir." Herwiha eşkere kir: "Di hevdîtina me de, qala rewşa ewlekarî û tevgera terorîstên DAIŞê hate kirin û herwiha bal li ser girîngiya prosesa reforma Pêşmerge hat kişandin."

Berpîrsê Mihwerê Mexmûr -



Giwêr ê Pêşmerge destnîşan kir: "Wan fermanaran kêfxweşiya xwe ya ji ber operasyonên vê dawiyê yên bi hevbeşiya Pêşmerge û

Artêşa Iraqê li dijî terorîstên DAIŞê diyar kir û daxwaz kirin ku ev hema-hengî û hevkarîya girîng berdewam be."

**PeyamaKurd**

## Mazlûm Kobanî: Daxwaza Şamê ne cihê qebûlkirinê ye



Femandarê Giştî yê Hêzên Sûriya Demokratîk (HSD) Mazlûm Kobanî diyar dike, rejîma Sûriyê dixwaze vegere rewşa berî 2011an, lê ew ne cihê qebûlkirinê ye û ew vegera berî sala 2011an red dikan.

Femandarê HSDê Mazlûm Kobanî diyar dike, hebûna Hêzên Amerîkî li Rojavayê Kurdistanê û navçeyên din ên Rêveberiya Xweser, ji bo çareserkirina krîza

Sûriyê gelekî girîng e.

Nêzîkî 900 leşker û şewirmendên leşkerî yên Amerîkî li navçeyên bin desthilata HSDê û Binkeya Leşkerî ya Tenef hene û pêgeha wê ya bi hêz li Encûmena Ewlekarî û navendên din tê wê wateyê ku bê Amerîka krîza Sûriyê nayê çareserkirin.

Mazlûm Kobanî destnîşan dike: "Baweriya me wisa ye ku bêyî

Amerîkayê, çareseriya siyasî li Sûriyê bidest nakeve. Girîng e Amerîka bimîne ji bo ku bigihêjin çareseriyêke siyasî. Divê Amerîka di vî warî de rol bibîne. Ev nêrîna me ye. Mebesta min ew e, rola Amerîkayê ne tenê ji bo şerê dijî DAIŞê ye, lê rola wî welatî ji bo gihîştina çareseriya siyasî jî gelek pêwîst e. Take rê ji bo têkbirin û jinavbirina DAIŞê, çareseriya siyasî ye li Sûriyê."

Fremendarê HSDê Mazlûm Kobanî eşkere dike, tiştê ku Şam ji wan daxwaz dike, ne cihê qebûlkirinê ye.

Mazlûm Kobanî dibêje: "Em dixwazin bi rejîma Sûriyê re bigihêjin rêkeftineke siyasî. Hinek pêwendîya me li gel hev heye. Ew caran pêwendî li gel me dikin, lê em negihîştine xalekê ku rêkeftin hebe. Rejîma Sûriyê dixwaze vegere sala 2011an, wate ji bo pêş bûyerên sala 2011an, ev jî ne guncav e. Me jê re gotiye ku nabe vegerin rewşa berî 2011an." **PeyamaKurd**

## Bafil Talebanî ji bo hevdîtina ligel Serok Barzanî gihîşt Pîrmamê

Hevserokê Yekîtiya Niştimaniya Kurdistanê (YNK) Bafil Talebanî ji bo bi Serok Mesûd Barzanî re bicive îro Pêncşembê danê êvarê gihîşt Pîrmamê.



Sekreterê Giştî yê PDKê Fazil Mîranî beriya vê hevdîtinê ragihandibû ku wê Serok Barzanî li ser mijara posta serokomariya Iraqê û çend mijarên din ligel Bafil Talebanî bicive.

Tê çaverêkirin herdu alî li ser çend mijarên taybet bi Herêma Kurdistanê û Iraqê gotûbêjê bikin ku li gorî daxuyaniya Mîranî, mijara sereke ya hevdîtinê nakokîya PDK û YNKê li ser posta serokomariya Iraqê ye. Hêjayî gotinê ye, namzedê PDKê yê serokomariya Hoşyar Zêbarî ye, yê YNKê jî Berhem Salih e û niha Dadgeha Bilind a Federal a Iraqê namzediya Zêbarî li ser gilîyê hinek aliyên rawestandîye û heta roja Yekşemê biryar li ser namzediya wî ji nû ve tê dayîn.

**PeyamaKurd**

## Li Kerkûkê metirsî ji dagîrkirina erdê 2 hezar cotyarên Kurd heye

Hersal cotyarên Kurd li Kerkûkê di dema ajotina erdên xwe de ji aliyê Ereben ku hatine Kerkûkê ve, rastî astengî û pirsgerêkan tên. Berpîrsê Kerkûkê jî dibêje, rêveberiya niha ya Kerkûkê piştgiriya Ereben şovîni dîke ji bo dagîrkirina erdên Kurdan.



Cêgirê Berpîrsê Encûmena Serkirdatiya Kerkûk - Germiyan a PDK Diyarî Husên ji malpera KDP.info re ragihand: "Ew Ereben ku di dema rêjîma Beis de bi çek û bi zorê destê xwe danîbûn ser erdên Kurdan, niha jî wek berê bi piştgiriya rêveberiya Kerkûkê dixwazin dîsa erdê Kurdan ji wan bistînin û ji xwe re bibin."

Li gorî zanyariyên malpera KDP.info metirsî li ser 2 hezar perçe erdên Kurdan heye ku were dagîrkirin.

Wî berpîrsê PDKê wiha got: "Piraniya wan Ereben şovîni piştî azadkirina Iraqê xwe wek koçber nivîsandine û piştî ku hatin tawîzkirin û qerebûkirin vegeriyan cihên ku jê hatibûn, lê niha dîsa vegeriyan Kerkûkê û dagîrkarî destpê kiriyê."

Diyarî Husên wiha domand: "Dema deselata Kurdî li Kerkûkê nema, metirsî ket û dikeve ser Kurdên wan navçeyên derdora Kerkûkê, ji ber ku ew Ereben ku erdên Kurdan dagîr dikin, piştgiriya wan heye ji aliyê leşkerî û îdarî ve û alîkariya wan tê kirin, ev jî xebareke din e ji bo bi erebkirinê. PDK hertim piştî cotyarên Kurd û xelkê navçeyên Kurdistanî yên madeya 140 digre û em bi riya nûnerên xwe li Bexdayê hewl didin ji bo bidawîhatina proseya bi erebkirinê." **Kerkûk-KDP.info**

## Serokwezîr Barzanî 52. salvegera Yekîtiya Nivîskarên Kurd pîroz kir

Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî, îro 10ê Sibatê bi minasebeta 52yemîn salvegera



damezrandina Yekîtiya Nivîskarên Kurd peyameke pîrozbahiyê weşand.

Serokwezîr Mesrûr Barzanî di peyama xwe de got: "Bi boneya pêncî û duyemîn salvegera damezrandina Yekîtiya Nivîskarên Kurd, pîrozbahiyên herî germ arasteyî endamên melbenda giştî û hemû endamên Yekîtiya Nivîskarên Kurd û nivîskarên Kurdistanê bi giştî dikim." Serokwezîr Barzanî da zanîn, "Yekîtiya Nivîskarên Kurd di dirêjahiya temenê xwe de roleke girîng di xizmetkirina ziman û edebiyata Kurdî û tevgera ronakbîriyê li Kurdistanê dîtiye û her dem di qonaxên xwe yê cuda yê dîrokî de xwedî helwesta niştimanî bûye di mijara berevanîkirina mafên rewa yê gelê Kurdistanê de."

Mesrûr Barzanî di dawiya peyama xwe de wiha got: "Di vê boneyê de, bi rêz û pêzanîne ve, em hemû wan nivîskar û rewşenbîrên Kurdistanê bi bîr tînin, ku bi nivîs û berhemên xwe û helwesta xwe ya niştimanî, di rêza pêş a dakokîkirina nasname û nixên pîroz ên gelê Kurdistanê de bûn. Salvegera Damezrandina Yekîtiya Nivîskarên Kurd li hemû nivîskarên Kurdistanê pîroz be û her dem serkeftî bin."

**PeyamaKurd**

## Wezaretê Tenduristiyê rewşa dawî ya Covid-19 eşkere kir: 5 wefat û 984 pêketiyên nû

PeyamaKurd - Wezaretê Tenduristiyê ya Herêma Kurdistanê eşkere kir ku di nav 24 demjimêrên borî de 984 kesên din bi vîrûsa Koronayê (Covid-19) ketine û 5 kesên jî wefat kirine.

Di daxuyaniya Wezaretê Tenduristiyê de hat eşkere kirin; di 24 demjimêrên borî de 984 kes bi vîrûsa koronayê ketine, ji wan 463 kes li Hewlêrê, 104 kes li Silêmaniyê, 384 kes li Duhokê, 10 kes li Helebceyê, 23 kes li Germiyanê ne.

Wezaretê ragihand ku di nav 24 demjimêran de 5 kesên canê xwe ji dest dan, ku ji wan 3 kes li Hewlêrê û 2 kes li Duhokê ne.



Herwiha hat diyarkirin ku di 24 demjimêran de 1517 kes ji vê nexweşiyê rizgar bûne, ku ji wan 895 kes li Hewlêrê, 170 kes li Silêmaniyê, 413 kes li Duhokê, 2 kes li Helebceyê, 37 kes li Germiyanê ne.

Bi van amarên dawî re li Herêma Kurdistanê hejmara giştî ya pêketiyên koronayê gihîşt 420 hezar û 516 kesên, ya mirinan û 7 hezar û 287 kes û heta niha 397 hezar û 662 pêketî jî baş bûne.

**peyamakurd.com**

## Mesrûr Barzanî li gel konsul û nûner û dîplomatên welatan civiya

Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê li gel konsul û nûner û dîplomatên welatan li herêma Kurdistanê civiya û di civînê de serokê hikûmetê balkêşa ser rewşa navxwe ya Herêma Kurdistanê û çaksaziyên kabîneya nehem û pêwendiyên di navbera Herêma Kurdistanê û Hikûmeta Federal a Iraqê.

Îro Şemiyê 12.02.2022yê Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê di civîna li gel nûnerên welatan de behsa hewldanên pêkanîna hikûmeta nû ya Iraqê kir, ku pêwîst e hikûmetek be di xizmeta hemû hemwelatîyên Iraq û pêkhateyên cuda de be û bibe cîhê seqamgirî û aşî û asayîşa Iraqê.

Serokê hikûmetê behsa wê yekê jî kir ku Herêma Kurdistanê berdewam kar kiriye ji bo ku pêwendiyên herî baş li gel hikûmeta federal a Iraqê hebe û hemû pirs-girêk bi awayekî bingeîn û li ser bingehe destûrê bînin çareser kirin.

Mesrûr Barzanî amaje bi karnameya hikûmeta Herêmê ya ji bo hemû cure kirina aborî û zêde kirina çavkaniyên dahat û kêmkirina xerc û rêxistina bac û karasanî kirin ji bo hilberînerên biyanî û navxwe û dijital kirina xizmetan ku pêngavekî girîng ji bo pêşxistin û bihêz kirina hemahengiya di navbera saziyên hikûmetê bi



awayekî modern û hevçerx û kêmkirina gendeliyê bi cureyekî ku xercên rojane yê hikûmetê û bi sistema online û bi awayekî şefaf û aşkera bînin encam dan.

Herwaha diyar kir, li gel nakokiyên siyasî li Iraq û herêma Kurdistanê, lê me nehiştîye ew pirs-girêk û nakokî bandorekî xirab nav hikûmeta Herêmê de bikin, berevajî wê pêwendî û hemahengiyekî baş di navbera endam û beşdarên kabîneya nehem de heye.

Serokê hikûmetê teqez kir Herêma Kurdistanê faktorekî girîng e seqamgiriya li navçeyê ye û dixwaze pêwendiyên dostane li gel welatên cîran û pêşxistina pêwendiyên li gel civaka navnetewî bi giştî pêkbîne. Her-

waha amaje bi giringiya berde-wambûna alîkarî kirin û hema-hengî kirina li gel Herêma Kurdistanê kir, ji bo tekoşîna gefên terorîstên DAIŞê û bi taybet jî li navçeyên Kurdistanê yê derveyî îdareya Herêma Kurdistanê û bi rêya nehiştina valatiya ewlehiyê yê li wan navçeyan û çalak kirina navendên hemahengiya ewlehiya hevbeş a di navbera Pêşmerge û artêşa Iraqê ve kir. Di seravekî din ê mijara civînê de jî serokê hikûmetê amaje bi pirs-girêka koçberan û tewdîrên hikûmeta herêmê yê ji bo tekoşîna koça neyasayî jî anîn ziman. Dawiyê de jî Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê bersiva nêrîn û tîbînî û pirsên amadebûyan da. **kdp.info**

## General Michael Erik Kurilla: Kurd hevpeymanên jêhatî û cihê baweriyê ne



General Michael Erik Kurilla çav li rê ye bibe Fermandarê Hêzên Navendî yê Amerîkayê (CENTCOM) di bersiva xwe ya pirsê Senator Jim Inhofe de, pesnê jêhatîbûna Kurdan da û got, "Bi rastî hevpeymanên xwedî şîyan û cihê baweriyê ne." Fermandarê Hêza 18 ya Artêşa Amerîkayê General Michael Erik Kurilla, bi fermî ji bo posta Femandariya Hêzên Navendî yê Amerîkayê hatiye namzedkirin û tê çaverêkirin piştî pesendkirina Encûmena Pîran cihê fermandar Kenneth McKenzie bigire. Senator Jim Inhofe li ber lijneyê Encûmena Pîran a Amerîkayê pesnê Kurdan da û berê xwe da General Kurilla û got: "Fermandar Kurilla, min gelek caran serdana Mesûd


Barzanî, hevrêyê me yê li Hewlêrê kiriye, Kurdên Iraqê yek ji wan in ku cihê baweriyê zêde ne û li gor min divê hûn piştrast bin ji wê ku berdewam bin li ser pêşkêşkirina piştewaniyê baş bo Kurdên hevrêyên me û bi hevahengî li gel hikûmeta Iraqê." Herwiha Inhofe pirs ji Kurilla kir, "Gelo tu jî hevnerîni li ser berdewambûna pêşkêşkirina piştewaniya berdewam û baş ji bo Hêzên Pêşmerge, bi mebesta qayîmkirin û pêşxistina bihevrekarkirina me û berjewendiyên me yê hevbeş li herêmê? Gelo di çarçoveya ezmûna xwe ya şexsî de, tu jî hevnerîni li ser vê? General Michael Erik Kurilla jî di bersiva xwe de got: "Birêz senator min li gel Kurdên hevpeymanên me kar

kiriye û min dîtiye ku ew cihê baweriyê zêde ne û gelek bi şîyan in. Sala 2004an di yekem serdana xwe de bo Iraqê de, min li gel wan kar kiriye û paşê jî 2014an di erka rûbirûbûna terorê de min li gel wan kar kiriye ku ji bo min derketiye;

(Kurd) bi rastî hevpeymanên xwedî şîyan û cihê baweriyê ne." Herwiha Kurilla li ser dosyeya çekdarên DAIŞê û kesûkar û zarokên wan ên li Kampa Holê û zindanên Rojavayê Kurdistanê ragihand, "Li gor min divê, bi rêya hikûmet û hewlên navdewletî alîkariya Hêzên Sûriya Demokratîk (HSD) bê kirin ji bo veqerandina beşek ji wan desteserkiriyên DAIŞê ku nêzikî 10 hezar desteserkiriyên DAIŞê li nav çendînan navendên desteserkirinê ne û artêşek ji DAIŞê li wê derê ye ku me dît li Heskê êrişê birin ser zindanê. Herwiha 60 hezar endamên malbatên DAIŞê hene û zêdetirî ji %80 ji wan jin û zarok in û di nav kampa Holê de ne û dizanin ew di bin helmata guherîna bîr û baweriyê de ne. Lewma divê di wî warî de hikûmet û hewlên navdewletî alîkariya HSDê bikin." Kaynak: General Michael Erik Kurilla: Kurd hevpeymanên jêhatî û cihê baweriyê ne **peyamakurd.com**



# Serok Barzanî û Berpirsa Ofîsa Pêwendiyên YEyê proseya siyasî ya Iraqê gotûbêj kirin



Serok Mesûd Barzanî îro Sêşema 8ê Sibata 2022yan li Selahedîn pêşwazî li Berpirsa Ofîsa Pêwendiyên Yekîtiya Ewropayê ya li Herêma Kurdistanê Marie Paret kir.

Di hevdîtîne de geşedanên herî dawî yên proseya siyasî ya Iraqê û pêngavên destûrî yên pêkanîna hikûmeta nû ya Iraqê hatin gotûbêjkirin. Herwiha di hevdîtîne de li ser rêyên çareseriyê yên ji bo derbaskirina astengî û zehmetiyên li ber proseya siyasî ya Iraqê, danûstandina fikr û ramanan hat kirin. **KDP.info**

# Wezîrê Veguheştin û Gihandinê li ser rêya trêne: Wê sûde bide aboriya Kurdistan û Iraqê

Wezîrê Veguheştin û Gihandinê yê Herêma Kurdistanê Ano Cewher di derbarê rêya trêne de axivî û diyar



kir, ji bendera Faw heta deriyê sînorî yê Îbrahîm Xelîl, projeyeke mezin e û wê sûde bide aboriya Kurdistan û Iraqê.

Ano Cewher eşkere kiriye: "Em li Bexdayê bi Rêveberiya Rêya Trêne ya Iraqê û Rêya Trêne ya Tirkîyê re civiyan, em weke Wezareta Veguheştinê ya Herêma Kurdistanê, me nêrînen xwe ji bo rêya trêne eşkere kir."

Cewher da zanîn: "Me plana xwe da her du aliyên Iraqî û Tirkîyê, ku divê rêya trêne ji Kerkûkê were Hewlêrê û ji vir biçê Mûsilê û ji wir jî biçê parêzgeha Duhokê heta Zaxo û Deriyê Sînorî yê Îbrahîm Xelîl, ji wir jî nava axa Tirkîyê û bi rêya Nisêbînê heta digihêje Ewropayê."

Wezîrê Veguheştinê da zanîn; ev proje ji bo siberoja aboriya Kurdistan, Iraq û Tirkîyê gelek girîng e, ev ji bo welatên cîran û welatên Kêbdavê jî pêgeheke wê ya girîng heye, lêkolînek heye ku kelûpelên ji rojhilat tên û diçin Ewropayê, niha di 18 rojan de digihîjin, lê belê bi çêkirina vê xetê, di 12 rojan de digihîjin û lêçûnên wê jî kêmtir dibin.

Herî dawî Ano Cewher destnîşan kir; çêkirina vê xetê ji bo hemû wan welatan bi sûde e, tevî wê jî li Herêma Kurdistanê projeyeke xeta navxwe heye, ku ji Silêmaniyê ber bi Hewlêrê û bajarên din ên Herêma Kurdistanê dirêj dibe. **PeyamaKurd**

# Profesor Zera Üsif koça dawî kir

Lêkolînera navdar Prof. Zera Üsif (Zera Elî Yûsûpova) roja sisê sibatê 2022an de çû dilovaniya xwe.

Prof. Zera Üsif di 16ê çileyê pêşîn a sala 1934an de



li bajarê Tîblîsê di nav malbateke kurd-êzdi da ji dayîk bûye. Wê piştî xwendina xwe ya seretayî, di sala 1953an de dibistana navîn li bajarê Tîblîsîyê bi serkeftineke bilind xilas kiriye.

Keça kurd Zera Üsif di sala 1958an Fakulteya Rohilatzanîyê ya Zanîngeha Lênîngradê ya Dewletê (beşê zimanzanîya Îranî) temam kir. Wê di nav lêkolîner û zanyarên eyan yên rohilatzan de cihê xwe girt û bala xwe da ser zimanê kurdî û zaravayên wê. Wê li cem prof. Qanatê Kurdo û zanyarên rohilatnas yên ûris û ermenî xebatên xwe yên zanistî pêşda bir.

Zera Üsif profêsora Beşa Lênîngradê ya Zanîngeha Dewletê, mamostaya zimanê kurdî bû. Wê serwêriya Înstîtûya Rohilatzanîyê ya Akademîya Zanyarî û Beşa Lênîngradê ya Zanîngeha Dewletê kiriye.

Ewê zêdeyî 70 berhemên zanyarî dane çapkirin ku di nav wan da lêkolînen wê yên sereke wek: Zaravên zimanê kurdî yên kêmtirîn (li gor çavkanîyên nivîskî û tekstên folklorê) û çapkirina klasîkên wêjeyî ne. **dengekurdistan.nu**

# Mîranî: Piştî Mam Celal ti sûdeke serokomariya Iraqê ji Kurdan re çênebûye

PeyamaKurd - Sekreterê Polît-buroya Partiya Demokrata Kurdistanê (PDK) Fazil Mîranî, li ser mijara hîlbijartina serokomarê nû yê Iraqê û pêwendiyên PDK û YNKê daxuyanî dan.

Sekreterê Polît-buroya PDKê Fazil Mîranî di hevpeyvîna ligel beşa kurdî ya Dengê Amerîka de got: "Pirsgirêka Hoşyar Zêbarî bi rastî ne gendelî ye. Li gorî raportên destpêkê yên ku me dîtîye, xirab birêvebirina darayî bûye, yasaya karûbarên darayî heye li wezaretê, yê ku ew kar kiriye ango ew karmend berpîrsin jê, yê ku dane dadgehê û hîn biryara dawî ya dadgehê jî ji dadgeha Kerx re nehatiye dayîn. Biryara Dadgeha Federal jî dê bikeve roja Yekşemê, gelo dê biryara dawî jî bê red kirin, yan dê bê guhertin."

Mîranî destnîşan kir ku rêya lihevkerîne bi YNKê de heye û got: "Îro Kak Bafil dê bê gel Cenabê Serok, lê divê me berbîjêrekî yedek jî hebe, êdî em ligel YNKê rêkbikevin yan rêknekevin. Dadgeha Federal nêrîna xwe biguhere yan neguhere, yedek baş e û dê berbîjêrekî me yê din jî hebe."

Fazil Mîranî diyar kir, nabe daxwaza yekrêziya kurd bê kirin û di heman demê de bê gotin ku hemû tiştêk bo me û YNK jî bêbeş be: "Serok Barzanî baş dibîne ku divê em dawîya tûnelê jî bin, her



bîgehîna rêkeftinekê. Çi bihevre ji tûnelê vegerin û çî bihevre derbas bibin. Bi piştrastî divê em mafên biraderên YNKê jî dabîn bikin."

Fazil Mîranî got, rêkeftina ligel YNKê û li ser yek berbîjêrê rêkeftin egera herî baş e û got: "Ev çendî care serokomar ji biraderên YNKê re tê dayîn, ma qey çî dibe vê carê ji bo çar salan bila ji bo PDKê be û peywîrên din ji biraderên YNKê re bê dayîn."

Mîranî eşkere kir: "Heta niha ji bo Kurdistanê peywîra serokomar ti destkeftêkî wê nebûye, lê ji ber kurdek bûye serokomarê Iraqê ew yek ji bo kurdan dîsa jî girînge. Ji ber yekem desthilata hatî diyarkirin a Iraqê ye. Ya din jî derveyî xwedê jê razî Mam Celal bo nimûne bixwe desthilat dida xwe û

bi pêwendiyên kesî tiştêk dikir ji bo Kurdistanê û bi rêya budçe be yan bi rêyên meseleyên din be kar dikir ji bo Kurdistanê, lê piştî wî ti sûdek û destkeftêkî wê peywîrê ji bo Kurdistanê nebûye."

Mîranî li ser vetokirina PDKê ya li ser navê Berhem Salih jî got: "Bi nêrîna me Kak Berhem hin pêngav avêtin pêwîst bû nekiriba. Wê ziyana gihande kurdan û ji bo kurdan ti tiştêk nekiriye. Tiştê em dibînin, ango ez dibêjim ew zîrekiya ku Berhem Salih heye ji bo kurdan bikar neaniye di serokomariya Iraqê de. Ji bo YNKê û PDKê jî bikar neaniye. Dikare bê gotin ji bo xwe bikar aniye, ez naxwazim ji vê zêdetir meselê bikim kesî. Ji ber divê hêlsengandina Kak Berhem YNK bike." **peyamakurd.com**

# Li Tirkîyê û Bakurê Kurdistanê 76 baroyan li dijî bihayên elektrîkê daxuyaniyek belav kirin



Li Tirkîyê û Bakurê Kurdistanê, 76 baroyan li dijî bihayên elektrîkê daxuyaniyek belav kirin û diyar

kirin, enerjiya erzan mafêkî bîngehîna her kesî ye û gotin, em ê ji bo daxistina bihayên elektrîkê serf

li rêyên yasayî bidin.

Di daxuyaniya ku baroyên Stenbol, Enqere, Îzmîr û Diyarbekirê jî di nav de hat eşkerekirin: "Piştî di 31ê Kanûna 2021ê de, tarîfeya firotina elektrîkê hat guhertin, bihayên elektrîkê bi awayekî sosret hatin zêdekirin. Guhertina tarîfeya bikaranîna elektrîkê li dijî xalên 2., 10. û 167an ên destûrê û li dijî xala 14. A Peymana Mafên Mirova Ewropayê ye."

Ew baro destnîşan dikin: "Gihîştin û erzanbûna elektrîkê mafêkî bîngehîna mirovan e. Em 76 baro li dijî zêdekirina bihayên elektrîkê ne û divê bihayên elektrîkê ji bo welatiyan bîndaxistin û em ji raya giştî re radigihînin ku, wê ji bo vê serf li hemû rêyên yasayî bidin." **PeyamaKurd**

## Ji Komeleya Şêx Seîd daxuyaniya 97emîn salvegera Serhildana Şêx Seîd: Rewş ne guherî ye

Serokê Komeleya Şêx Seîd û Hevalên wî, neviyê Şêx Seîdê Pîran Mihemed Qasim Firat di salvegera 97emîn ya serhildana Şêx Seîd de daxuyaniya da.



Serokê Komeleyê û Neviyê Şêx Seîd, Mihemed Qasim Firat di daxuyaniya, 97emîn a serhildana Şêx Seîd de got, piştî 97 salan fişarên li ser Kurdan didomin û Kurd ji hemû mafên xwe bêpar hatine hiştin ku rewşa niha ji ya sala 1925an ne cudatir e.

Firat diyar kir, Kurdan piştî Şerê Cihanê yê Yekemîn doza welatê xwe kirin, lê Kurdistan hate parçekirin û li tu parçeyekî mafên wan nehatin qebûl kirin.

Qasim Firat da zanîn, bi wê armancê Şêx Seîd û hevalên wî serî hildan, lê piştî şikestina serhildanê û bidarvekirina Şêx Seîd û 47 hevalên wî, hîn jî cihê gorên wan nayên diyarkirin.

**PeyamaKurd**

## SANA: Îsraîlê bi balafiran derdora Şamê bombebaran kir

Ajansa Sana ya hikûmeta Şamê ragihand, Îsraîlê do nêzî 1ê şevê, bi balafiran derdora Şamê bombebaran



kir. Li gor zanyariyan, di encama bombebaranê Îsraîlê de, leşkerekî hikûmeta Şamê hat kuştin û 5 jî birîndar bûn. Herwiha di derbarê êrişê de, ajansê agahî bi parve nekir û ev agahî jî spartin çavkaniyê leşkerî.

Li gorî van agahiyan: "Êriş, derdora 1ê şevê pêk hat. Hin moşek ji başûr rojhilatê Beyrûtê û hin jî ji aliyê Colanê ve dihatin avêtin." Herwiha hat destnîşankirin, sîstema parastina asîmanî rê li ber moşekan girtiye û çend ji wan anîne xwarê û di encama êrişê de, leşkerekî hikûmetê hat kuştin û 5 jî birîndar bûn û ziyaneke madî gihandiye derdorê.

**PeyamaKurd**

## HSDê li ser topbarana Tirkîyê û kuştina zarokêkê daxuyaniya da

Hêzên Sûriya Demokratîk (HSD) li hesabê xwe yê fermî yê twitterê derbarê topbarana navbera Amûdê û



Dirbêsiyê ku zarokêk hatibû kuştin daxuyaniya da û ragihand, ti tevgerê hêzên wan li wê herêmê nîne. HSDê diyar kir ku arteşa Tirk her roj êrişên topbaranê li hember herêmê pêk tîne û di wan topbaran de welatîyên sîvîl hedef digire. Herwiha HSDê da zanîn, "Herî dawî di topbarana arteşa Tirkîyê ya li bejahiya di navbera Amûdê û Dirbêsiyê de, zarokêkî din jî jiyana xwe ji dest da."

HSDê diyar kir, "Arteşa zarokujî vê rastiya xwe hewl dide bi nûçeyên derew berevajî bike. Nûçeyên ku qaşo 29 şervanên me xwestine êrişî wan bikin û hatine şehîdxistin derew e. Tevgerên hêzên me li herêmên novborî tune ne."

**PeyamaKurd**

## Hunermendekî Kurd doz li Cibûrî û Qeymeqamê Kerkûkê vekir

Hat ragihandin ku hunermendekî Kurd ê li Kerkûkê, li ser tunebûna xizmetguzariyan û xemsariya rêveberiya bajêr, li parêzgarê sepanî yê Kerkûkê Rakan Cibûrî û Qeymeqamê Kerkûkê doz vekir.

Hat zanîn ku hunermend Zanyar Cûme heftaya borî li ser tunebûna xizmetguzarî û xemsariya îdareya bajêr, li dijî Parêzgar û Qeymeqamê Kerkûkê doz vekir ku biryar bû îro yekem rûniştina dadgehê birêve biçê, lê belê ew di rûniştinê de amade nebûne.

Li gorî nûçeya K24ê Zanyar Cûme gotiye: "Doh ji aliyê dadgehê ve hatim agahdarkirin ku îro rûniştina darizandinê heye, ez îro çûm dadgehê, lê belê ne parêzgar, ne jî Qeymeqamê Kerkûkê amade nebûn, dadger gotinên min wergirtin û min hemû giliyên xwe pêşkêş kirin, dadgehê soz da ku di rûniştina duyem de parêzgar û qeymeqam dê amade bin."

Hunermendê Kurd daye zanîn: "Giliyê min li dijî parêzgar



û qeymeqam, li ser tunebûna xizmetguzariyan e, ev bajar bûye zibîlxane, daxwaza sereke ew e ku demên dayîna elektrîkê li Kerkûkê gelek kêmtir e û buhayê elektrîka jeneratorê gelek giran e, loma min daxwaz kir ku kêşeyên me werin çareserkirin, bihayê elektrîka jeneratorê were kêmkirin, herwiha li nava bazarê jî rêgirî li kar û xebatên xelkê tê kirin, welatî nikarin kar bikin, berê xelk ji bajarên din dihatin Kerkûkê dixebitîn, niha bazara Kerkûkê bêkar e."

Zanyar Cûme gotiye: "Dadgehê ji min re got, cara ewil e parêzgar û qeymeqam li ser giliyê welatîyêkî ji bo dadgehê tene bang kirin."

Cûme diyar kiriye: "Eger li Dadgeha Kerkûkê derbarê wan de lêpîrsîn neyê kirin û bê encam bibe, ez ê li Wezareta Dadê doz vekim, eger li wir jî nebe, ez ê li Neteweyên Yekbûyî doz vekim, heta bi encam nebe ez ê dest jê bernedim, nabe tevî van hemû dahatên petrolê, rewşa bajarê Kerkûkê wiha be." **PeyamaKurd**

## Serdozgeriya Komarê ya Enqerê Leyla Guven de doznameyêke nû amade kir

Serdozgeriya Komarê ya Enqerê, di derbarê Hevseroka Giştî ya KCDê Leyla Guven de bi îdiaya "propagandaya rêxistinê" doznameyêke nû amade kir.

Li 9emîn Dadgeha Cezaya Giran a Diyarbekirê, duyemîn danîşana doza ku bi îdiya "propagandaya rêxistinê" li Hevseroka Giştî KCDê Leyla Guven ku li Girtîgeha Jinan a Xarpêtê girtî ye hatibû vekirin, hat dîtin. Guven, ji Girtîgeha Xarpêtê bi rêya SEG-BÎSê tevî danîşinê bû. Parêzerê Guven Serdar Çelebî jî li danîşinê amade bû. Di danîşinê de derket holê ku ji aliyê Serdozgeriya Komarê ya Enqerê ve bi îdiya "propagandaya rêxistinê" derbarê Guven de doznameyêke din hatiye amadekirin. Di danîşinê de ji Guven hat xwestin ku li dijî doznameya hatiye amadekirin



parastin bike. Guven li dijî vê derket û ji bo lêkolînkirinê daxwaz kir dozname jê re bê şandin. Guven, da zanîn ku qeydên dengên wê yên bi Kurdî yên di dosyayê de şaş hatine wergerandin û xwest ku parvekirinê wê yên medya sanal ên sûc hatine hesabandin jê

re bêt şandin.

Parêzerê Guven Çelebî jî got ku tevî daxwazên muwekîla xwe dibê û ji bo parastinê daxwaza dema zêde kir. Serokê Dadgehê hemû daxwazan qebûl kir û danîşinê taloqî 11ê Nîsanê kir.

**PeyamaKurd**

## Protesto û xwepêşandanên dijî rejîma Esed 4 roj in berdewam dikin

Hat ragihandin ku protesto û xwepêşandanên 3 roj berê li bajarê Siweyda yê jêr kontrola rejîma Esed dest pê kiribûn di roja 4emîn de jî berdewam dikin.

Çavdêriya Mafên Mirovan li Sûriyê (SOHR) ragihand ku xelkê gundê Micadel rêya diçe bajêr girtin û xelkê bajarokê Nemra jî hemû rê girtin û tenê rê dan ku xwendekar, mamoste û karkerên xizmetên awarte derbas bibin.

Herwiha SOHRê diyar kir ku doh bi şev jî sewqiyatên hikûmeta Şamê gihîştine bajêr.

Hêjayî gotinê ye, 3 roj berê xelkê bajarê Siweydayê yê li başûrê Sûriyê li dijî biryarên rejîma Esed ku beşeke mezin a xelkê ji alikariyê bê par hatine hiştin,




xwepêşandan li dar xistibûn.

Di xwepêşandanên belav bûn de, banga hilweşandina rejîma

Esed û bicihanîna biryara Neteweyên Yekbûyî ya 2254an hat kirin.

**PeyamaKurd**

## Mesrûr Barzanî tekezî li ser giringiya pirojeya xeta tirênê li Kurdistanê dike



Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî pêşwazî li nûnerê wê kompaniya Almanî kir ya ku bo projeya xeta tirênê ya Kurdistanê bi hikûmetê re girêbest îmze kiriye.

Serokwezîr Mesrûr Barzanî îro Pêncşema 10.2.2022


pêşwazî li berpîrsê kompaniya Almanî ya hêla hesin ya bi navê Deutsche Bahn li Ewropa û Rojhilata Navîn û Rojhilata Nêzîk, Vincent van Houten kir.

Di civînê de ku konsulê giştî yê Almanya li Herêma Kurdistanê, Klemens Semtnerji amade

bû, nûnerê kompaniya Detsche Bahn kurte raportek li ser wê girêbesta ku di navbera wan û hikûmeta Kurdistanê de hatiye îmzekirin, pêşkêşî Serokwezîr Mesrûr Barzanî kir. Nûnerê wê kompaniya Almanî da zanîn ku ev pêngaveka destpêkê ye bo destpêkirina pirojeyeka wiha girîng ku di ji çend qonaxan pêk tê û ji aliyê çend kompaniyan ve tê cîbicîkirin.

Serokê Hikûmeta Kurdistanê jî tekezî li ser girîngî û stratejîkbûna pirojeya xeta tirênê ya Kurdistanê kir ku dê bibe sebaba bihêzbûna jêrxana aborî ya Kurdistanê û pevgerêdadna bajar û deveran û pêşxistina danûstandina bazirganî di navbera Kurdistan û deverên din yê Iraqê û welatên cîran û cîhanê. **Hewlêr-KDP.info**

## Mesrûr Barzanî: Rêya hesin a Kurdistanê projeyê stratejîk e



Serokwezîr Mesrûr Barzanî îro Pêncşemê li Hewlêrê bi Rêveberê Cîbicîkar ê Ewropa û Rojhilata Navîn yê Kompaniya Rêya Hesin a Almanî "Deutsche Bahn" Vincent van Houten re civiya. Di civîna ku Konsulê Giştî

yê Almanya yê li Hewlêrê Klemens Semtner jî amade bû de, Nûnerê Kompaniya Deutsche Bahn kurteyek derbarê hevîmkirina navbera Hikûmeta Herêma Kurdistanê û Kompaniya Deutsche Bahn de

pêşkêş kir ji bo şewir û serperîştîkirina rêya hesin li Herêma Kurdistanê.

Nûnerê Kompaniya Deutsche Bahn diyar kir ku ev pêngava destpêkê ye ji bo dest bi vê projeya girîng bikin ku ji çend qonaxan pêk tê û ji aliyê çend kompaniyên cuda ve tê pêkanîn.

Serokwezîr Mesrûr Barzanî tekezî li girîngiya encamdana vê projeya stratejîk kir, bi arasteya avakirina jêrxaneke bihêz a aboriyê ji bo Herêma Kurdistanê û girêdana bajar û navçeyan û pêşvebirina danûstandina bazirganiyê ya navbera Herêma Kurdistanê û navçeyên din ên Iraqê û welatên cîran û cîhanê. **PeyamaKurd**

## Rêya Kevirî ku di 132 salan de hatibû çêkirin di bin avê de ma

Rêya kevîrî ya bi dirêjîya 7 kîlometan a li navçeya Kemaliye ya bajarê Ezirgan ê Bakurê Kurdistanê di bin avê de ma.

Li gorî zanyariyan, ew rêya kevîrî piştî destpêkirina projeyê di heyama dawî ya Osmanîyan de, di nav 132 salan de ango sala 2002yan hatiye temamkirin.

Hat ragihandin ku ji ber berfa zêde ya zivistanê îsal û bi helîna berfê re ew rêya dîrokî di bin avê de maye û otomobîl tê de asê mane. Di wê rêya kevîrî de, 38 tunel, kendal û vîrajên teng



hene û zêdetirî deh gundan bi hev girê dide û xelkê deverê jî



ber girtina rê nikarin çûnûhatina xwe bikin. **PeyamaKurd**

## Li çiyayê Korek îro 4emîn Festîvala Berfê destpê kir



PeyamaKurd – Li çiyayê Korek ê Herêma Kurdistanê, îro 4emîn Festîvala Berfê destpê kir

û di festîvalê de çend çalakî tîn lidarxistin.

Festîval îro di saet 11:00an

de destpê kir ku bi serperîştîya Rêveberiya Geştûguzariya Soranê û Binkeya Geştûguzariya Riwandiz û Civaka Geştyarî ya Çiyayê Korekê ve tê lidarxistin.

Serperîştîyarên festîvalê eşkere dikin; Civaka Geştyarî ya Çiyayê Korekê, şiyana wê ya pêşwazîkirina 5 hezar geştyaran heye, ev 4emîn Festîvala Berfê ye li çiyayê Korekê, ku gelek geştyar di festîvalê de amade dibin. **peyamakurd.com**

## Serokwezîrê Herêma Kurdistanê êrîşa ser Balafirgeha Ebhayê şermezar kir

Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî, bi peyamekê êrîşa ser Balafirgeha Ebhayê ya li Erebiştana Siûdî şermezar kir.



Serokwezîr Mesrûr Barzanî di peyama xwe de eşkere kir: "Ez bi tundî êrîşa îro ya li ser Balafirgeha Ebhayê şermezar dikim."

Di berdewamiyê de Mesrûr Barzanî destnîşan kir: "Ez ji zêdebûna êrîşên bi rêya dronan nîgeran im, bi taybetî li dijî jêrxana aboriya medeniyane." Herê dawî Serokwezîrê Herêma Kurdistanê hevsozî û piştevaniya xwe ji bo gel û hikûmeta Erebiştana Siûdî nîşan daye. Hûsiyên Yemenê do bi rêya dronan êrîşî balafirgeha sivilî a Ebhayê ya li Erebiştana Siûdî kirin. **PeyamaKurd**

## Çend nihênîyên PKKê yên li Şingalê hatin eşkerekirin

Li Şingalê, çend nihênîyên li ser êrîş û bombebaranên demên dawî yên Tirkîyê li dijî binkeyên PKKê,



kar û planên çekdarên PKKê, ji aliyê çavkaniyekî nêzî sekirdiyên PKKê hatin eşkerekirin.

Li gor çavkaniyê ku nexwest navê wî were eşkerekirin daye zanîn, di êrîşa esmanî ya van demên dawî yên Tirkîyê li dijî binke û baregehên PKKê de, hejmarek çekdarên PKKê can dane.

Herwiha destnîşan kiriye; ji bilî kuştina çekdarên PKKê, herî kêma 8-10 karkerên Erebiştanê jî di wan bombebaranên de hatine kuştin, ku bi mebesta lédana tunel û veşargeh, ji aliyê çekdarên PKKê ve ji bo çiyayê Şingalê hatibûn veguhestin. **PeyamaKurd**

## PeyamaKurd – Li Efrînê çekdarên girêdayî Tirkî, 6 kesên din revandin

Malpera Efrîn Postê diyar kiriye, çekdaran du welatî ji heman malbatê li gundê Quta yê bi ser navçeya Bilbilê revandin.



Hatiye eşkerekirin, çekdaran girtine ser malên her welatîyên bi navê Kemal Cafer yê 47 salî û Ehmed Cafer yê 48 salî û ew revandine. Herwiha heta niha jî çarenûsa wan ne diyar e.

Di berdewamiyê de hat ragihandin ku çekdarên ser bi dewleta Tirkî, ji navenda Efrînê 4 kesên din revandine û heta niha navên wan eşkere nebûne.

Li aliyê din hat diyarkirin, çekdaran herî dawî 25 dar li gundê Xalnêrê birîne. **peyamakurd.com**

## Dadgeha Bilind a Federal a Iraqê doza li dijî Hoşyar Zêbarî wê yekşemê gotûbêj bike

Dadgeha Bilind a Federal a Iraqê, wê roja Yekşemê doza li dijî namzedê serokomarê Iraqê yê PDKê Hoşyar Zêbarî gotûbêj bike.



Biryar bû roja 7ê Sibate di rûniştina duyem a Parlamentoyê de serokomarê nû bê hilbijartin. Lê ji ber çend nûnerên ser bi YNKê ve, doz li dijî Hoşyar Zêbarî vekirin û ji ber wê Dadgeha Federal jî proseya hilbijartina Hoşyar Zêbarî rawestandibû. Namzedê PDKê yê serokomarê Iraqê, Hoşyar Zêbarî ye û 31 kursiyên PDKê li Parlamentoya Iraqê hene. Hevpeymanên PDKê, bi taybet fraksiyona Sedir û Hevpeymaniya Siyade ya Sunniyan, piştevaniya namzedê PDKê dikin ku bibe serokomarê Iraqê.

**PeyamaKurd**

## Wezareta Xwendina Bilind a Sûriyê li Heseke xwendina li kolêj û peymangehan radiwestîne

Wezareta Xwendina Bilind a Sûriyê bi daxuyaniyekê diyar kir, li Heseke xwendina li kolêj û peymangehan radiwestîne.

Wezareta Xwendina Bilind û Lêkolînên Zanistî ya Sûriyê di daxuyaniya xwe de eşkere kir, xwendin li kolêj û peymangehên parêzgeha Heseke yên ser bi Zanîngeha Ferat, radigire.

Wezareta Xwendina Bilind a Sûriyê, sedema wê ragirtinê da zanîn û got, sedem ew e ku hejmarek ji avahiyên kolêjan li Heseke rastî têkdan û talankirinê



hatine, ew jî piştî rewşa dawî ku bi sedema bûyera Zindana Sînaa çêbû, bi taybetî Kolêja Endazyariya Çandiniyê.

Herwiha di biryara wezareta hikûmeta Sûriyê de nehatiye diyarkirin, kengî careke din ew kolêj û peymangehê vebin.

**PeyamaKurd**

## Balafirên Tirkîyê de vera Bradost bombebaran kir

Balafirên şer ên Tirkîyê îro Sêşemê baregehên PKKê yên de vera Biradost a Herêma Kurdistanê bombebaran kir.



Li gorî zanyariyan balafirên şer ên Tirkîyê li demjimêr 11:45an binkeyên PKKê yên li zozanên Berbezîn û çiyayê Bolê li de vera Bradostê bombebaran kirin. Hat diyarkirin, ji ber ku beriya niha xelkê sivîl ji ber hebûna PKKê terka wan deveran daye û di vê werza Zivistanê de jî koçer neçûne wan zozanan, ti zianên canî yên sivîl di encama bombebaranê de çênebûne.

**PeyamaKurd**

## Fazil Mîranî: Pêngavên Berhem Salih ziyan gihandine Kurdan û tiştek ji bo Kurdan nekiriye

Sekreterê Polîtbiroya PDKê Fazil Mîranî dibêje, bi nerîna me Berhem Salih hinek pêngav avêtiye ku gerek ew pêngav neavêtiba, ji ber ku ziyan gihandine Kurdan û wî ji bo Kurdan tiştek nekiriye.

Fazil Mîranî ji Dengê Amerîka re ragihandiyê: "Dibe ku em û YNK li ser kesekî lihev bikin ji bo kursiyê serokmar, ku ne ji herdu aliyan be. Ji bo Kurdistanê kursiyê serokmar ti qazanca wê tune ye. Tenê Mam Celal Talebanî bi pêwendiyên xwe ji bo Kurdistanê kar dikir. Ez bawer nakim piştî Mam Celal yek ji YNK were yan ji PDKê here û karibe wek Mam Celal kar bike."

Derbarê pirsra hebûna ner-



azîbûnê li cem PDK li ser kesê Berhem Salih ji bo ku bibe serokmarê Iraqê, Mîranî wiha got: "Bi nerîna me, Kekê Berhem Salih hinek pêngav avêtiye ku herek navêtiya, ji ber ku ziyan gihandine

Kurdan û ji bo Kurdan tiştek nekiriye. Kekê Berhem zîrekiya xwe ji bo Kurdan bikar neaniye. Ji bo YNK û PDK jî bikar neaniye. Em dikarin bêjin bo şexsê xwe bikar aniyê." **Hewlêr-KDP.info**

## Ji bo projeya rêhesina Kurdistanê bi kompaniya Alman re peyman hat îmze kirin



Wezareta Avedankirin û Akincîbûnê ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê bi kompaniya Almanî Deutsche Bahn re pey-

mana hevtêgihîştinê ji bo bicihanîna projeya rêhesinê îmze kir. Wezîrê Avedankirinê Dana Ebdulkerîm di civîneke roj-

namevanî ya bi beşdariya nûnerê Deutsche Bahn de got ku plana projeya rêya hesin a Herêma Kurdistanê ji sala 2012ê ve heye.

Li ser lêçûnên darayî yên projeyê Wezîrê Avedankirinê diyar kir: "Em hewl didin ku kompaniyên navdewletî beşdariyê bikin. Me karî bi kompaniyaya Deutsche Bahn re guftûgoyê bikin ku ew baştirîn kompaniyaya cîhanê ya vê derberê de ye." Dana Ebdulkerîm herwiha got: "Piştî guftûgoyên sal û nîvekê, îro me peymana hevtêgihîştinê îmze kir. Ew peyman jî ji bo cîbicîkirina rêya hesin a li Herêma Kurdistanê ye." **PeyamaKurd**

## Wezareta Pêşmerge bi Şêwirmendê Mezin ê Hevpeymaniya Navdewletî re civiya

Wezareta Pêşmerge bi Şêwirmendê Mezin ê Hevpeymaniya Navdewletî re, di mijara çaksaziyê de, li wezaretê civiya.

Wezareta Pêşmerge ya Herêma Kurdistanê do di daxuyaniyekê de diyar kir; îro 9ê Sibata 2022yan Rêveberê Pêwendî û Hemahengiyê yê li Wezareta Pêşmerge Mihemed Seîd bi Şêwirmendê Hêzên Hevpeymaniya Navdewletî Tad Boros re civiya.

Daxuyaniya wezaretê eşkere dike, civîn li ser proseya çaksaziyê ya li Wezareta Pêşmerge bû. Her-



wiha daye zanîn, Rêveberiya Pêwendî û Hemahengiyê ya Wezareta Pêşmerge, roleke wê ya

bi bandor û baş heye di bihêzkirina pêwendiyên Hevpeymanan de ligel wezaretê. **PeyamaKurd**

## Li 4 parêzgehên Bakurê Kurdistanê dibistanan rojekê navber dan perwerdehiyê

Li 4 parêzgehên Bakurê Kurdistanê, ji ber şert û mercên xerab ên hewayê, dibistan, rojekê hatin girtin. Li parêzgehên Wan, Agirî, Erzîngan û Colemêrgê yên Bakurê Kurdistanê, j, ber rewşa hewayê ya nerênî dibistan heta rojekê îro hatin girtin.

Parêzgarîyên wan bajaran diyar kirine, li navçeyên Zêdkan, Hamur û Avkevîr yên ser bi Agirî, li navçeya Geverê ser bi Colemêrgê, li navçeya Elbakê ser bi Wanê û li navçeyên Mansî, Tercan û Otluk-



belî ser bi Erzînganê, dibistanên seretayî û navîn heta rojekê, 11ê Sibata 2022ê hatine girtin. Herwi-

ha wê karmendên kêmendam û ducanî jî betlanê û naçin sazîyên lê dixebitin. **PeyamaKurd**

## AKP'liler bile HDP'ye şikayet ediyor



HDP Mardin İl Eşbaşkanı Salih Kuday, kayyum belediyeçiliğinin kent halkı üzerinde de ciddi tahribatlar yarattığını söyleyerek, "AKP'ye oy verenler dahi artık HDP'ye gelerek şikayette bulunuyor" dedi.

Kayyumların, tamamen kültürel asimilasyon ve rant paylaşımını amaç edindiğini söyleyen HDP Mardin İl Eşbaşkanı Salih Kuday, Yozgat ve Çorum'dan yöneticiler getirildiğini, asker ve polis eskilerinin istihdam edildiğini ifade etti.

ANF'ye konuşan HDP Mardin İl Eşbaşkanı Salih Kuday, kayyum rejiminin her şeyden önce bir sömürgecilik ürünü; 100 yıllık cumhuriyetin Kürt halkının iradesini tanımadığının göster-

gesi olduğunu kaydetti.

Kayyumların, tamamen bir kültürel asimilasyon ve rant paylaşımını amaç edindiğini belirten Kuday, şunları söyledi: "2016'da atanan kayyum, dönemimizde açılan kadın kurumlarını kapatmakla işe başladı. Gençlik ve kültür kurumları kapatılıp, yerlerine asimilasyon odaklı kurumlar açıldı. Uğur Kaymaz gibi Kürt halkının hafızasında yer edinmiş sembol bir ismin heykelini kaldırarak, kültürümüze ve hafızamıza saldırdı. Demografik yapıyla oynamayı sürdürüyor. Halkın cebinden çıkan paraları nasıl dağıttıkları artık alenileşti."

**POLİS VE ASKER İSTİHDAM EDİLİYOR**

Kayyum belediyeçiliğinin

Mardin'in özünü asimile etmek ve kökünden koparmak üzerine kurulduğunu vurgulayan Kuday, şöyle devam etti: "Kayyum belediyelerinde neredeyse tüm yönetim kadrosu Çorum ve Yozgat gibi farklı kentlerden getirildi. Belediyelerde de onlara daire başkanlığı ve benzeri önemli konumlar tahsis edildi. Hatta polis ve asker geçmişi olan ya da o görevlerden istifaları sağlananlar, belediyelerde istihdam ediliyor. Tüm bu kötü yönetim ve rant dayalı belediyeçilik pratiklerinden dolayı dün AKP seçmeni olanlar bile bizim partimizden yana tavır almaya başladı."

**YEREL GAZETECİLER TEHDİT EDİLİYOR**

Kürtlerin dışındaki diğer halklardan da HDP'ye ciddi akış olduğunu, tüm kesimlerin tahribatları gördüğünü belirten Kuday, şunları ekledi: "İnsanlar gelip bu durumu bize itiraf etmeye başladı. Mardin'deki yerel basın da olan gazetecilerden de duyuyoruz bunu. Her gün boy boy AKP'nin ve kayyumun reklamını yapan basın kurumları dahi artık gerçeği gizleyemediklerini, ancak aileleriyle tehdit edildikleri için bunları yazamadıklarını söylüyor." [anfurkce.com](http://anfurkce.com)

## Vanlı gençlerin üniversite hayali belediyenin kursuyla gerçeğe dönüşüyor

Geçen yıl 303 öğrencinin üniversiteye yerleşmesine katkı sunan Büyükşehir Belediyesi, ücretsiz eğitim kurslarıyla bu yıl da 662 öğrenciyi sınavlara hazırlıyor.

Van'da özel kurslara gitme imkanı olmayan 662 öğrenci, Büyükşehir Belediyesi Sürekli Eğitim Merkezinde üniversite sınavına hazırlanıyor. İçişleri Bakanlığınca görevlendirme yapılan belediye, alt ve üst yapı ile sosyal ve kültürel çalışmaların yanı sıra eğitime de önemli katkılar sunuyor.

Van Valiliği, Büyükşehir Belediyesi ve İl Milli Eğitim Müdürlüğü'nün ortak çalışması sonucu 2017'de hizmete açılan Sürekli Eğitim Merkezi, tecrübeli ve alanında uzman eğitim kadrosuyla öğrencilere ücretsiz hizmet vermeye devam ediyor.

Önceki yıl üniversiteye hazırlanan 347 öğrenciden 303'ünün başarı göstererek üniversiteye yerleşmesine katkı sunulan merkezde, bu yıl da 662 öğrenciye hazırlık kursu veriliyor.

Öncelik dezavantajlı gençler ve çocuklar

Belediyenin eğitime destek çalışmaları, üniversiteye yerleşmek isteyen dezavantajlı öğrencilerin de umudu oldu.

Büyükşehir Belediyesi Genel Sekreteri Mehmet Fatih Çelikel, AA muhabirine, 8 branşta, 21 öğretmenle üniversite hazırlık kurslarında öğrencilere eğitim verdiklerini söyledi.

Haftanın altı günü 662 öğrenciye ücretsiz kurs verildiğini anla-



tan Çelikel, "Geçen yıl 347 öğrencimizin 303'ü bu sınavlarda başarılı olup üniversitelere yerleşti. Tıp, eczacılık, mimarlık gibi birçok farklı alanda çocuklarımız muvaffak oldu. Bu hizmeti çok güçlü bir şekilde çocuklarımıza, gençlerimize destek anlamında sürdürmek istiyoruz." dedi.

Gençlerin hayallerini gerçekleştirmelerine yardımcı olduklarını vurgulayan Çelikel, şunları kaydetti:

"Önceliğimiz dezavantajlı gençlerimiz, çocuklarımız. Bu noktada onların almış olduğu neticeler bizleri de çok mutlu ediyor. Çocuklarımız hafta içi 6 gün boyunca sabah saat 08.00'den 21.00'e, hafta sonları da sabah 09.00'dan 17.00'ye kadar burada ders çalışabiliyor, bu ortamdan istifade edebiliyorlar. Etüde kalan çocuklarımıza aynı zamanda yiyecek, içecek ikramlarımız oluyor. Sadece bununla kalmıyoruz, aynı zamanda edebiyat, kültür, rehberlik ve gezi kulüplerimiz ile bütün sosyal

etkinliklerimizin içerisine katmaya gayret ediyoruz. Hem ders çalışsınlar, hayallerine, hedeflerine ulaşsınlar hem de bu arada sosyal aktivitelerden geri kalmassınlar istiyoruz."

